



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Tîrêjên Çarşembê

Xelek - 50

Gelo Pêximber Îbrahîm Hûrî bû? **(beşê sêhem)** **Pêximber Îbrahîm di Încîl û Qur'anê da**

Pêximber Îbrahîm di Încîlê da:

Agahdariyên derbarê pêximber *Îbrahîm* di Încîlê da pir kurtin; yên here diyar du tiştin:

A - Pêximber *Îsa* bi kok û binyata xwe vedigere ser pêximber *Îbrahîm*. *Îsa* vedigere ser *Ya'qûb* (Îsraîl) kurê *Îshâq* kurê *Îbrahîm*.

B - Piştrastkirina pêximber *Îsa* di axaftina xwe da ji bo oldarên Cihûyan ku pêximberî ji Îbrahîm ra hatiye, dema ku ew li Ûra Keldanan bû: {**Xedayê bala ji bavê me Îbrahîm ra xuyabû, dema ew li Mêzopotamiyayê bû, pêş ku here li Heŕanê bi cih û war bibe. Jêra got: Ji erdê xwe û ji nav êla xwe derkeve û here wî erdê ku ez şanî te didim. Wê hingê ji erdê Keldanan derket û li Heŕanê bi cih bû**}¹.

Di Tewratê da hatiye ku yê biryara koça ji Ûr bo Heŕanê daye *Tareh* bavê *Îbrahîm* bûye û ku Xweda ji *Îbrahîm* ra li Heŕanê xuya bûye û ferman daye wî ku berê xwe bide erdê Ken'an (Îsraîl / paşê Filestîn)².

Ka em niha derbas agahdariyên derbarê pêximber *Îbrahîm* di Qur'anê da bibin.

Pêximber Îbrahîm di Qur'anê da:

Ayetên Qur'anê ku di wan da pêximber *Îbrahîm* hatiye gotin peywendiya xwe bi şeş tiştan ra hene:

1 - Pêximber *Îbrahîm* ji wan kesane ku Xweda ew hilbijartiyê û di ser hemû mirovan ra girtiye: {**Xweda Adem û Nuh û malbata Îbrahîm û malbata Îmran hilbijartine û di ser sewranserê cihanê ra girtine**}

{مَا كَانَ إِبْرَاهِيمُ يَهُودِيًّا وَلَا نَصْرَانِيًّا وَلَكِنْ كَانَ حَنِيفًا مُّسْلِمًا وَمَا كَانَ مِنَ الْمُشْرِكِينَ. إِنَّ أَوْلَى النَّاسِ بِإِبْرَاهِيمَ لَلَّذِينَ اتَّبَعُوهُ وَهَذَا النَّبِيُّ وَالَّذِينَ آمَنُوا وَاللَّهُ وَلِيُّ الْمُؤْمِنِينَ}.³

2 - Pêximber *Îbrahîm* Misilman bûye, pêximber Mohemed û Misilman ji Cihû û Kirîstiyanan hêjatirin ku ew ji wî bin: {**Îbrahîm ne Cihû û ne jî Kirîstiyân bû; belê ew Henefî Misilman**}

bû û ne ji nebawermendan bû. Yên ku ji tevan hêjatir ji Îbrahîm bin, ewin yên ku li ser rêya wî diçin, wî wek pêximber dibînin û yên ku bawer kirine. Xweda li aliye bawermendane}

﴿مَا كَانَ إِبْرَاهِيمُ يَهُودِيًّا وَلَا نَصْرَانِيًّا وَلَكِنْ كَانَ حَنِيفًا مُّسْلِمًا وَمَا كَانَ مِنَ الْمُشْرِكِينَ. إِنَّ أَوْلَى النَّاسِ بِإِبْرَاهِيمَ لَلَّذِينَ اتَّبَعُوهُ وَهَذَا النَّبِيُّ وَالَّذِينَ آمَنُوا وَاللَّهُ وَلِيُّ الْمُؤْمِنِينَ﴾.⁴

3 - Şoreşa pêximber Îbrahîm li dijî pûtperest û exterperestan, hatina wî ser rêya yekbûna Xweda û cudahiya baweriya wî li gel bavê xwe û gelê xwe: {**Îbrahîm ji bavê xwe Azer ra got tu pûtan wek Xweda dibînî, ez te û gelê te di rêya çewt da dibînim. Dîsa me xwedayê asîman û zemînê şanî Îbrahîm da daku ji piştrastan be. Dema şev bi ser wî da hat, exterek dît û got ev xwedayê mine. Dema ku exter çû ava, got ez ji tiştên wenda dibîn heznakim. Dema ku heyva bi ronahî dît, got ev xwedayê mine. Dema ku ew çû ava, got heger Xweda rê şanî min nedaba, ezê rêwendayî bama. Dema ku dît roj bi şewq û şemale, got ev xwedayê mine, eva gewretire. Lê dema wenda bû, got ey gel ez ji nebawermendan dûrim. Min berê xwe da wî kesê ku asîman û zemîn afirandiye, ez bawermendim û ne ji nebawermendanim**}

﴿وَإِذْ قَالَ إِبْرَاهِيمُ لِأَبِيهِ أَرَزَرَأْتَتَّخِذُ أَصْنَامًا آلِهَةً إِنِّي أَرَاكَ وَقَوْمَكَ فِي ضَلَالٍ مُّبِينٍ. وَكَذَلِكَ نُرِي إِبْرَاهِيمَ مَلَكُوتَ السَّمَاوَاتِ وَالْأَرْضِ وَلِيَكُونَ مِنَ الْمُوقِنِينَ. فَلَمَّا جَنَّ [أَظْلَمَ] عَلَيْهِ اللَّيْلُ رَأَى كَوْكَبًا قَالَ هَذَا رَبِّي فَلَمَّا أَفَلَ [غَاب] قَالَ لَا أَحِبُّ الْآفِلِينَ. فَلَمَّا رَأَى الْقَمَرَ بَازِعًا [مُنِيرًا] قَالَ هَذَا رَبِّي فَلَمَّا أَفَلَ قَالَ لئن لَّمْ يَهْدِنِي رَبِّي لَأَكُونَنَّ مِنَ الْقَوْمِ الضَّالِّينَ. فَلَمَّا رَأَى الشَّمْسَ بَازِعَةً [مُشْرِقَةً] قَالَ هَذَا رَبِّي هَذَا أَكْبَرُ فَلَمَّا أَفَلَتْ قَالَ يَا قَوْمِ إِنِّي بَرِيءٌ مِّمَّا تُشْرِكُونَ. إِنِّي وَجَّهْتُ وَجْهِيَ لِلَّذِي فَطَرَ السَّمَاوَاتِ وَالْأَرْضَ حَنِيفًا [مُؤْمِنًا] وَمَا أَنَا مِنَ الْمُشْرِكِينَ﴾.⁵

4 - Bilindbûna cudahiya bîr û bawer di navber Îbrahîm û gelê wî da û rabûna wî bi roxandina pûtan û avêtina wî nava agir; derketina wî bi sax û selameti: {**Bi nehîni çû ba xwedayên wan û got hûn qet naxwin. Çima hûn napeyivin. Bi nehîni bi destê rastê li wan da. Zûka hatin ba wî. Ji wan ra got hûn ji peykerên we durist kirine ra pesrestiyê dikin?!**}

{ فَرَاغَ [ذَهَبَ سَرًّا] إِلَى آلِهَتِهِمْ فَقَالَ أَلَا تَأْكُلُونَ. مَا لَكُمْ لَا تَتَّقُونَ. فَرَاغَ [أَقْبَلَ سَرًّا] عَلَيْهِمْ ضَرْبًا بِالْيَمِينِ [بِالْيَدِ الْيُمْنَى]. فَاقْبَلُوا إِلَيْهِ يَزِفُونَ [يَسْرَعُونَ]. قَالَ أَتَعْبُدُونَ مَا تَحْنَتُونَ؟! }.

{**Hûn ji bilî Xweda ji hin tiştan ra nimêj dikin ku ne kara wan ji we ra heye û ne zîrar. Xwelî li serê we û ewê ku hûn ji bilî Xweda diperêsin, ma hiş nayê serê we. Gotin wî bisohtînin û li aliye xwedayên xwe bin; heger ya we raste. Me got agiro bibe sar û selameti li ser Îbrahîm. Xwastin tiştêkî bînin serê wî, lê me wisa kir ku ew derdin û bi sernekevin**}

﴿قَالَ أَتَعْبُدُونَ مِنْ دُونِ اللَّهِ مَا لَا يَنْفَعُكُمْ شَيْئًا وَلَا يَضُرُّكُمْ. أَفَ لَكُمْ وَلِمَا تَعْبُدُونَ مِنْ دُونِ اللَّهِ أَفَلَا تَعْقِلُونَ. قَالُوا حَرِّقُوهُ وَانصُرُوا آلِهَتَكُمْ إِنْ كُنْتُمْ فَاعِلِينَ. قُلْنَا يَا نَارُ كُونِي بَرْدًا وَسَلَامًا عَلَى إِبْرَاهِيمَ. وَأَرَادُوا بِهِ كَيْدًا فَجَعَلْنَاهُمُ الْأَخْسَرِينَ﴾.⁷

5 - Daxwaz û dirûza pêximber Îbrahîm ji bo Xweda ku kurekî bide wî. Kurek bû para wî û di pey ra ferman da wî ku kurê xwe wek gorî pêşkêş bike. Çîroka gorîkirinê: {**Got, kurê min, min di xewnê da dîtiye ku ez te serjêdikim. Binêre, tu çawa dibînî. Got, bavê min, tu wî tiştê ku ferman ji te ra hatiye bike, Xweda hez bike, ezê bi sebir û hedan bim. Dema ku fermana Xweda pejirandin û rûyê wî da xwar. Me gazî wî kir, ey Îbrahîm. Te bi xewnê bawer kir, emê jî xelata comerdan bidînê. Ev belayeka aşkera ye. Me ji ber va goriyek mezin dayê**}

قَالَ يَا بُنَيَّ إِنِّي أَرَى فِي الْمَنَامِ أَنِّي أَذْبَحُكَ فَانْظُرْ مَاذَا تَرَى. قَالَ يَا أَبَتِ افْعَلْ مَا تُؤْمُرُ سَتَجِدُنِي إِن شَاءَ اللَّهُ مِنَ الصَّابِرِينَ. فَلَمَّا أَسْلَمَا [طاعا أمر الله] وَتَلَّهُ لُجَبَيْنِ [كَبِه على وجهه]. وَنَادَيْنَاهُ أَنْ يَا إِبْرَاهِيمُ. قَدْ صَدَّقْتَ الرُّؤْيَا إِنَّا كَذَلِكَ نَجْزِي الْمُحْسِنِينَ. إِنَّ هَذَا لَهُوَ الْبَلَاءُ الْمُبِينُ. وَفَدَيْنَاهُ بِذَبْحٍ عَظِيمٍ.⁸

6 - Rabûna *Îbrahîm* bi avakirina Ke'beyê li Mekke, kurê wî Îsmâîl alîkariya wî dike û dêlîndêzên hecê çespandin: {**Îbrahîm bingeha malê avadikir û Îsmâîl digot Xwedayê me, ji me bipejirîne, tu guhdarî û zana yî. Xwedayê me, me bike ji Misilmanên xwe û ji senseleta me neteweyeka Misilman ji xwe ra peyda bike, dêlîndêzan şanî me bide, û li me bibihore, tu kesekî bihêrdar û dilovanî**}.

[وَأَذِ يَرْفَعُ إِبْرَاهِيمُ الْقَوَاعِدَ مِنَ الْبَيْتِ وَإِسْمَاعِيلُ رَبَّنَا تَقَبَّلْ مِنَّا إِنَّكَ أَنْتَ السَّمِيعُ الْعَلِيمُ. رَبَّنَا وَاجْعَلْنَا مُسْلِمَيْنِ لَكَ وَمِنْ ذُرِّيَّتِنَا أُمَّةً مُسْلِمَةً لَّكَ وَأَرِنَا مَنَاسِكَنَا [شعائرنَا] وَثُبْ عَلَيْنَا إِنَّكَ أَنْتَ التَّوَّابُ الرَّحِيمُ].⁹

توضيح: [العبارات التي بين [...] في الآيات هي شروح، وليست من القرآن].

Berhevdana gotûbêja tewratî û gotûbêja qur'anî:

Di navbera agahdariyên derbarê *Îbrahîm* di Tewrat û Qur'anê da hin tiştên hindik hevdu digirin, lê cudahî gelek in:

- 1 - Di Qur'anê da ji bo *Îbrahîm* tenha yek nav heye, ew jî *Îbrahîme*. Ti tişt derbarê navê *Ebram* ku di Tewratê da hatiye tineye.
- 2 - Di Qur'anê da ti tişt derbarê dema ku *Îbrahîm* têda jiyaye tineye.
- 3 - Di Tewrat û Qur'anê da ti tişt tineye ku *Îbrahîm* ji çî gel û neteweyê ye.
- 4 - Navê bavê *Îbrahîm* di Qur'anê da *Azere* تَارَح û di Tewratê da *Tarehe* تَارَح.
- 5 - Di Qur'anê da ti tişt derbarê koça malbata *Îbrahîm* ji Ûra Keldanan bo Hêranê tineye.
- 6 - Di Qur'anê da ti tişt derbarê koça *Îbrahîm* ji Hêranê bo erdê Ken'an tineye.
- 7 - Di Qur'anê da ti tişt derbarê koça *Îbrahîm* bo Misirê û vegera wî bo erdê Ken'an tineye.
- 8 - Di Qur'anê da ti tişt derbarê çîroka *Sareyê* li gel Fer'ewn û li gel padîşah *Abimalik* tineye.
- 9 - Di Qur'anê da ti tişt derbarê şerê ku *Îbrahîm* li dijî hevpeymanana rojhilatî kiriye tineye.
- 10 - Di Qur'anê da ti tişt derbarê torebûna *Sareyê* li ser *Hacerê* û qewitandina (beherdana) *Hacerê* û *Îsmâîl* tineye.
- 11 - Di Qur'anê da ti tişt derbarê mirina *Sareyê*, veşartina wê di şikefta ku *Îbrahîm* ji *Êfron* *kurê Soherê Hittî* kirîye da tineye.
- 12 - Di Qur'anê da ti tişt derbarê mirina *Îbrahîm* tineye.

Tiştên ku hên bêhtir bala mirov di vê berhevdanê da dikişînin çarin:

1 - Di Qur'anê da ti tişt derbarê dapoya ku Xweda daye *Îbrahîm* û senseleta wî tineye. Ya ku li gor wê mafê wî li standina erdê gelên ku di navbera çemê Ferat da li rojhilat heya bi çemê Nîl li rojava dijîn heye.

2 - Di Tewratê da ti tişt derbarê çîroka cudahiya navbera *Îbrahîm* û bavê wî û gelê wî li ser baweriyê nehatiye û ne jî ti tişt li ser avêtina wî nava agir û derketina wî bi sax û selametî heye.

3 - Di Tewratê da ti tişt derbarê peywendiya *Îbrahîm* bi Hicazê ra li Cezîra Erebiyê û rabûna wî bi kurê xwe Îsmâîl ra bi avakirina Ke'beyê û çespendina dêlîndêzên hecê tineye.

4 - Di Tewratê da yê gorî *Îshâqe*. Hin kesên ji şîrovekarên Qur'anê gotine ku yê gorî *Îshâqe*. Lê hinekên din gotine ku *Îsmâîle*. Dîrokzan Al-Tabarî الطَّبْرِي bêtir giranahiyê dide baweriyê beşê ku dibêjin: ew *Îshâqe*¹⁰.

Çarşemb, 09.03.2016

Jêder

¹ Tewrên pêximberan, Eshah 7, ayet 2 - 4.

² Rêwîtiya pêkhatinê, Eshah 11, ayet 31. Eshah 12, ayet 1 - 4.

³ Sûret Alî Omran, ayet 33

⁴ Sûret Alî Omran, ayet 67 - 68.

⁵ Sûret Al-En'am, ayet 74 - 79.

⁶ Sûret Al-Safat, ayet 83 - 98.

⁷ Sûret Al-Enbiya', ayet 66 - 70.

⁸ Sûret Al-Safat, ayet 100 - 107.

⁹ Sûret Al-Baqareh, ayet 127 - 128.

¹⁰ Al-Tabarî, dîroka Al-Tabarî, 1/363.